

Zimanê Xwe Bênxir Nebînin. Nimûne "Çima Alfebe û ne abe"

Derwêşê Xalib

Di hejmara (85)(Nîsan 2009) ya weşana **Newrozê** de, nivîser **Memê Alan** vê pirsê dike. Di despêkê de nivîser dibêje: "Her miletekî ji tîpên zimanê xwe re navlêkirinek dît û lêkir." lê piştî çend rêzan dinivîse: " hemî (navlêkirin) vedigerin binesaziya navlêkirina Yûnaniyan".

Di baweriya min de, ev herdu hevokên nivîser nakok in. Zêdetir, xebitandina "abe" ne bi dilê min e. Lê armanca min ne ev gotar bi xwe ye, lê nîşana berçavên min, ew nêzîkbûnên şaş ji pirsên zimên re ne. Jiber vê bersiva min dê bi çend xalan be.

A - Bêgoman, navlêkirina alfebe vedigere serdema Fînîqîyan. Dibêjin; evî miletî alfebeya pêşî dîzandiye,

Tîpên vê alfebeyê ev bûn (abcdhwzhtyklmns'fsqrst) (ابجد هوز حطي كلمن سعفص قرشت)

ا	ب	ج	د	ه	و	ز	ح	ط	ث
ا	ب	ج	د	ه	و	ز	ح	ط	ث
ا	ب	ج	د	ه	و	ز	ح	ط	ث
ا	ب	ج	د	ه	و	ز	ح	ط	ث

Tîpên pêşî (abcd) jê re bû nav. Bi Erebi tê gotin (ابجد- اجدية). Ji ber tîpa sisiyan (c) bi latîni wek (s) tê xwendin, jê re tê gotin (abceda, abecedarian, اجدية- اجد).

Li gorî dengên alfebeya kurdî, wê (abced-abcedî) an (ebced-ebcedî) bê xwendin. Dengê tîpa (c) di alfebeya kurdî de, ji xwendevan re diyar e.

B - Navê din yê alfebeyê (alphabet) ji kû hatiye

Alfebeya Yûnanî ji ber ya fînîqî hatiye girtin û paşê li tevaya oropa belav bûye, bi belavbûnê re guhertin ketine alfebeyê taku

gihiştiye Kurdên vê serdemê.

Navên çar tîpên alfebeya Yûnanî yên pêşî ev in: (Alfa, Bêta, Gama, Dêlta). Ev tîp jî ev in: (α β γ δ)

Navê vê alfebeyê bû (alphabet), tenê navên du tîpên pêşî bilêv dibin.

C - Navê sisiyan ji alfebeyê re

Navê sisiyan ku ji bo alfebeyê bikar tê; (ABC) ye. Wek bi inglîzî (êbîsî) tê xwendin. Dîsa jî, bilêvkirina çend dengên pêşî ji alfebeya wî zimanî ye. Li gorî alfebeya kurdî, ev (ABC) wê (abece) bê xwendin. Ev bilêvkirin dîsa nêzî (ebced) e.

Tevî peyva elifba ya kevna ku dihat û tê xwebitandin, em dibînin ku gelek hemwate yên ebcediyê di zimanê Kurdan de hene û pêwistiya "abe" nîne.

Nivîser çar xalan diyar dike, ku xebitandina peyva (abe) baştir e ji xebitandina peyva (alfebe), û her çar xalên nivîser jî durist in. Lê nivîser pirseke serekî li paş xwe dihêle, û napirse: " Gelo wek nivîser an sazî mafdar e, ku vekîta peyvekê kurt bike, an biguhere? ".

Nivîser dibêje: "...me biryara wê navlêkirinêda". Li cihekî din dibêje: " ji vir û wê ve, emê (abe) li şûna alfebe di çarçewa saziya xwe de bikarwînin".

Ez bawer nakim, ku armanca ciwamêrê Memê Alan ew e, ku zimanekî an şêwezarekî li şêwezarekî kurdî zêde bike, û ku ew şêwezar taybet be bi saziya wî.

Ji ber em tev zanin, ku zimanê kurdî zimanê Kurdan e, ne yê saziyekê, jinekê, an nivîskarekî ye. Bêguman bandora herkesî bi ziman daxive heye, û guhertin peyda dibe. Ew guhertin dibe ji ziman re qenc an neqenc be. Heger ew

D. R. 10